# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (254):

## Dijberîkirineke nû li ser Malbata "Pêşmerg", armanckirina sivîlan, girtinine bêsûcane, geregoşiya çekhilgirtinê û bikaranîna wê, serjimarine ewlekarî




Ji bilî afirandina dahatine diravî ji milîseyan re, bi riya ferzkirina sezayine bilind li ser girtiyên Kurd, û hurhutandin û pêkanîna bêtirîn fişar li ser wan û merivên wan da ku  bi aliyê koçberiyê ve werin têvedan, destlatên dagîrker girtinên bêsûcane di dermafê wan de bi rengekî rêkûpêkirî berdewam dike, bi riya destikên xwe ji milîseyan û sazûmana "ewlekarî - dadwerî" (ya ku ji aliyê wan ve hatiye damezrandin), û bi tuhmetên têvel û çêkirî (piraniya wan tuhmetan jî kiryarine sivîlî û ne şerkarî ne, sivîlina di dema Rêveberiya Xweser a berê de bi kar anîne, û dora 5 -11 sal jî di ser re derbas bûne).

**Ev jî hin bûyîn li ser rewşên serwerkirî ne:**

**= Dijberîkirinek li ser xortekî ji malbata Pakrewanên Newrozê:**

Li Êvara Yekşemê 23.7.2023an. Z, giropeke çekdar şerê xwe di xort "**Nezmî Eşref Osman** /16/sal" da, li ser riya ku mala wî dighîne ciyê karê wî li Bajarê Cindirêsê, û bi qundaqên çekan û keviran mekin lêxist, piştî kêrdanîna  ser stu û gefkirinê bi şerjêkirinê, û hewildana pêlêkirina bi makînê, û di encamê de şikestin û birînin di piyê wî de çêbûn, ziyan gihîşte stûna mofirkî  ya piştê wî, û tevaya laşê wî derizî, û ji ber wê ew bo nexweşxaneyeke Bajaroka "Eqrebatê - Idlib" (ya di bin desteserkirina "Desteya Tehrîr El'şam" de) ji bo dermankirinê hate şandin; Û ta niha tewankar nehatine şopandin û girtin.

Were bîranîn jî ku xort "Nezmî" ji Malbata "**Pêşmerg**" e, ya ku çar şehîd jê ketine, di encama komkujiya ku endamine Milîseyên "Artêşa/ceyş El'şerqiyê" pêk anîne  de, li Şeva Newroza 2023an. Z li Cindirêsê, ya ku

bi rengekî fere hate şermezarkirin û li ser erdê jî protestokirineke gelêrî ye Kurdî hate lidarxistin, nemaze ku merivên wan pakrewanan bi mafê xwe pabend in û li ser daxwaza sezakirina tewankaran rijd in; Û dijberan di dema dijberîkirinê de têrmine şofînî ji "Nezmî" re dubare kirin, û gotin: Em Şerqiyê ne û ev jî qeleng e, weke hewildanekê ji malbatê re, da ku radest bibin û doza pakrewanên xwe neşopînin û ji mafên xwe dagerin.

Herweha jî "**Desteya Tehrîr El'şam**" keys dît û bûyer çewsand, da ku bandora xwe li Cindirêsê xurt bike, vêca wê ji sê rojan ve "Artêşa/ceyş El'şerqiyê" neçar kir ku hersê biryargehên xwe yên ewlekarî li hundir Cindirêsê bigre, û bê ragîhandin û hebûneke fermî dest danî ser.

**= Armanckirina sivîlan:**

Hêzên Dagîrkeriya Turkiyê di bombebarankirina herêmên Gundewarê Bakurê Heleb (ên ku di bin desteserkirina Artêşa Sûrî de û tijî koçberên Efrînê) berdewam in:

- Li 23.7.2023an. Z, dora Gundê "Bênê" - Çiyayê Lêlûn bi topavêjê topebaran kir, di encamê de ziyanine şênberî çêbûn û "**Hêvîn Hemo Şero** /20/sal" a ciwan ji xelkê Gundê "Qîbarê" - Bajarê Efrînê bi perçehesinekî avêjtokan birîndar bû; Ewa ku ji dema dijberiya ser herêmê û dagîrkirina wê ve li 2018an. Z, penaberî G. "Bênê" bûye û lê rûniştî ye.

- Li 28.7.2023a. Z, "Gundê Mezin" - Çiyayê Lêlûn bi çekên orte armanc kir, û di encamê de zarok "**Xelîl Mihemed Oso** /14/sal" brîndar bû, û bo nexweşxana Bajaroka "Zehra'ê" ya hevcîwar hate rêkirin.

- Li 29.7.2023an. Z, bi avêjtekê Bajarê "Tilrif'etê" topebaran kir, avêjtokek li cîgeheke belavkirina avê ket, ajovanekî sîtêrekê bi navê "**Azad Hisên Kul Dehdo** /35/sal" ji Gundê "Cela" - Reco birînda bû.

Divê bê bîranîn jî ku bavê wî yê temenmezin "**Hisên Ebdelah Kul Dehdo** /74/sal" bi neh din re -piranî zarok- li 2.12.2019an. Z pakrewan bû, di komkujiyeke ku Artêşa Turkiyê û milîseyên bi ser ve pêkanîne de, di topebarana "Tilrif'etê" de.

**= Girtinine bêsûcane:**

Istîxbaratên Turkiyê bi rengekî yekser hemî piroseyên girtina Kurdan li herêmê serpereşt dike, û lîsteyên navên armanckirî amede dike, da ku di cî de bigihêjin Anqerê, di bin navê "Lîsteyên Terorê" de; Û Destlatên Dagîrker ev girtin:

● Ji xelkê Bajaroka "Be'idîna" - N. Reco:

1- Li 26.7.2023an. Z, Hemwelatî "**Mihemed Mihemed Fatê Sinê** /45/sal - weke dermansaz kar dike", ji aliyê Milîseyên "Artêşa Leşkerî li Reco" ve, bi tuhmeteke çêkirî.

2- Li 27.7.2023an. Z, Hemwelatî "**Se'îd Ebdo Osman** /65/sal, **Hemîd Hemîd Kenco** /25/sal", ji aliyê "Asayêşa Reco" ve, bi tuhmeta têkeliyê bi Rêvebiriya Xweser (R.X) a berê re.

Were bîranîn jî ku şaşiyek di rapora me a berê de weha hat: Berdana Hemwelatî "**Isma'îl Arêf Elo**" yê ku li 16.7.2023an. Z hatiye girtin, lê ya rast "ew ji Hepsa Asayêşa Reco" bo Hepsa "Maratê" ya navendî li Efrînê hate guhestin, û ta niha tê de bendkirî ye.

Herweha jî dadgeha dagîrkeriyê "**Ehmed Bekir Elî** /43/sal" bi salek hepis seza kir û "**Mihemed Nezmî Hemdî** /44/sal" jî bi şeş heyv hepis digel sezayine diravî, ewên ku li 1.5.2023an. Z ji aliyê "Asayêşa Reco" ve bi tuhmeta têkeliyê bi (R.X) berê re hatine girtin, û ta niha jî di Hepsa "Maratê" ya navendî de bendkirî ne.

● Ji xelkê Gundê "Dêrsiwanê" - Navça Şera:

1- Hemwelatî "**Hisên Mistefa Hedek** /50/sal - seqetbûn di piştê de heye", ji dora çar heyvan ve, bi tuhmeteke çêkirî, û ta niha di Hepsa Ezazê de bêsûcane bendkirî ye, û Milîseyên "Firqit El'sultan Mûrad" dest danîn ser makîna wî (cîp şofirlê) û di navenda Navça Bilbilê de bi kar tînin, digel dizîna/15/hezar Dolar Emrîkî li dema basmîşkirina mala wî.

2- Hemwelatî "**Elî Newaf Ebid El'ezîz** /40/sal - berberî dikir", ji malê û ji du heyvan ve, û birin Hepsa Ezazê bi tuhmeteke çêkirî, ta ku li 28.7.2023an. Z hate berdan, piştî dandina merivên wî /5/hezar Dolar weke reşwet û baceyine diravî.

● Ji xelkê Gundê "Ebûdanê" - N. Bilbilê: Hemwelatî "**Elî Reşîd Qasêm** /45/sal" ji du salan ve, bi tuhmeteke çêkirî, û ta niha di Hepsa Reco ya Reş de -ta bê dadgehkirineke wêneyî jî- bêsûcane bendkirî ye.

● Ji xelkê Gundê "Kokanê" - Navça Mabeta: Ji dora du heftan ve, Hemwelatî "**Xelîl Ebdo kurê Arêf** /35/sal", ji aliyê Milîseyên "Firqit El'sultan Silêman Şah" ve, bi tuhmeta têkeliyê bi (R.X) a berê re, piştî sê rojan ji vegera wî ji aliyê penaberiyê - Heleb bo cî û warê xwe û lêvegera wî ji wan re ji bo "serastkirina rewşa xwe", û ew radestî Milîseyên "Asayêşa sivîl li Mabeta" hate kirin, û paşê bo Hepsa "Maratê" ya navendî hate guhestin.

● Ji xelkê Bajaroka "Celemê" - Navça Cindirêsê: Li 24.7.2023an. Z, Hemwelatî "**Mihemed Mistefa Binefşê** /30/sal, **Ebid El'rehman Hisên Elîko** /35/sal, **Xalêd Resûl Kelxelo** /28/sal, **Cim'e Mistefa Ewan** /27/sal", ji aliyê Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Cindirêsê" ve, bi tuhmetên têkeliyê bi (R.X) a berê re, û sisê ji wan piştî ferzkirina baceyine diravî li ser hatin berdan, û ta niha "Binefşê" bêsûcane bendkirî ye.

● Ji xelkê Gundê "Şêxûtka" - N. Mabeta: Ji bîst rojan ve, Hemwelatî "**Farûq Zekeriye Reşo** /25/sal", ji aliyê "Asayêşa Mabeta" ve û birina wî bo Hepsa "Maratê" ya navendî, bi tuhmeta têkeliyê bi (R.X) a berê re, û ta niha bêsûcane bendkirî ye.

Û li 27.7.2023an. Z, destlatên dagîrkeriyê Hemwelatî "**Hisên Reşîd Hemze**" ji xelkê Bajaroka "Kefersefre" berdan, ê ku li 15.7.2023. Z hatî girtin, piştî ferzkirina baceyeke diravî /300/Dolar Emrîkî li ser.

**= Geregoşî û serberdayetî:**

- Li êvara 27.7.2023an. Z, li Gundê "**Hopka**" - Navça Reco, di dewata kurapê serkêşekî Milîseyên "Lîwa'i El'şemal" "Ebû Ebela El'zurbe" de **qurşîn pir hatin avêtin**, û qurşîn bi ser malên gund û Bajaroka Reco ya nêzîk jê ve ketin, di dema ku xelk ji ber germa Havînê li ser banên malan xew dikirin, lê destlatên dagîrkeriyê deng bi xwe nexistin, û avêtina qurşînan di boneyan û nav sivîlan de qedexe nakin, û hilgirtina çekan û bikaranîna tewşankî jê re, ji aliyê endamên milîseyan û piraniya sivîlên anînde ve (yên li herêmê hatine niştecîkirin) tiştekî normal û ne bendkirî ye.

**= Binpêkirinine din:**

- Di navboriya hefta çûyî de, ewlegeha/emniyeta Milîseyên "Feyleq El'şam" **serjimareke niştecîbûnê** çêkir û daxuyanin kesayetî û malbatî yên ewlehiyê li Gundên "Çeqmaqê Mezin û Çûçik, Elemdara, Çençeliya" - Navça Reco û hin din ji gund û bajarokên ku di bin desteserkirina wan de -yên ku tê de "Selîl El'xalidî" serkêşiya wan dike- li navçê amede kirin, ji bo Istîxbaratên Turkiyê, bi behaneya hûrlêrandina belavkirina alîkariyan; Ji bo şopandina nêzîk ji Kurdan -niştecîyên resen- yên mane û zaro û merivên wan ên li dervayî herêmê rûdinin re.

Girtinên bêsûcane di dermafê Kurdan de li Efrînê, ji zagona mirovahî ya navdewletî û destûr û zagona cezayên Sûrî re berevajîkirineke mezin e; Û bi ser ku kiryarên wan girtiyan ne tewanin li dijî kesan an civakê û dewletê bûn, ew bi kevnandina/kevinbûna ku li gor zagonê tê şikestin giştîkirî ne.

30.07.2023 an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

- Xortê birîndar û dijberîkirin li ser çêbûye "Nezmî Eşref Osman".
- Birîndar "Azad Hisên Kul Dehdo".
- Qurşîn li ser nivînên xewê li ser banê maline Bajaroka Reco.
- "Selîl El'xalidî" Serkêşê Milîseyên "Feyleq El'şam" li Navaça Reco.